 *Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)*

 *wergera ji erebî: Mustefa Reşîd*


# Tîrêjên Çarşembê

**Xelek - 7**


# Lavaya Rojê di navbera Exnatûn û Zeradeşt da

## Destpêk:

Fer’ewn *Exnatûn (Ixnatûn)* li ber kenarên çemê Nîl jiyaye. Derbarê dema desthilatdariya wî, di navbera dîroknasan da hinek cudahî heye. Hinek dema jiyana wî dikin 1377 heya 1358 b.z., hinek dikin 1375 heya 1358 b.z., hinek dikin 1370 heya 1353 b.z., hinek dikin 1369 heya 1353 b.z. û hinek jî dikin 1367 heya 1350 b.z. *Exnatûn* şoreşeka ayînî li Misirê pêkaniye, wî ayîna xwedawend *Amûn (Amîn)* ji holê rakiriye û li cihê wê ayîna xwedawendê yekane û yekem Atûn xistiye cihê wê, û ev xwedawend bi dîska (qaşa) rojê nîşan daye; wî navê kesayetiya xwe jî guhartiye û ji *Amûnĥûteb* kiriye *Axin Atûn (Exnatûn),* yanê “hezkirê Xweda *Atûn*, yan jî *Aton jê razî*[1].



Fer'ewn *Exnatûn*



Xwedayê rojê *Atûn*

Li hêla din, pêximberê Madan *Zardeşt* li Atropautene (Azerbeycanê), li herêmeka bakur-rojhilatê Mîdiya, li nêziya gola Ûrmiya jiyaye. Li ser dema jiyana wî jî cudahî heye. Hinek dema jiyana wî dixin navbera 1750 heya 1500 b.z. yan jî navbera 1400 heya 1200 b.z. û hinekên din dixin 630 heya 553 b.z. yan jî 618 heya 541 b.z. (*Serinc: Kurdên me yên Êzîdî dibêjin ku bêhtirî Zardeştekî hebûne. Belkî sedem jî ev be (wergêr)*). Wek ku tê zanîn, Zardeşt ayîna perestina xwedawendê yekane *Ahûra-Mezda* (xwedayê xêr û ronahiyê) li nav Madan belavkiriye, û ayîna *Mezdayî (Ezdayî)* ya Ariyanî ji sihirbazî û efsaneyan paqij kiriye û bi pêş xistiye; û roj wek nîşana xwedayê yekane *Ahûra-Mezda* hiştiye. Emê di demên pêş da lêkolînên taybet derbarê Zardeştiyê pêşkêş bikin[2].



Pêximber Zardeşt




Xwedayê rojê Ahûra-Mezda

## Lavaya Exnaton ya xwedayê rojê:

*Exnatûn* ev lavija ayînî bi coş ji pesindana xweda *Aton*, ku nîşana wî roj bûye, gotiye. Ev wek dua û dirûza nimêjê ye ku gelek gengaze, ev di nimêjê da dihate xwandin. Evin hin beş ji vê lavijê:

"Derketina te di asoyê asîman da çiqas xweşe!
Atûnê zindî, tu destpêka jiyanê yî!
Dema tu di asoyê xawerê (rojhilat) da hiltêyî!
Tu seranserê zemînê bi zîbaya xwe tijî dikî!
Tu zîbayî, zor çakî, bi teysî yî, balayî li ser serê her kesekî!
Ronahiya te zemînê hembêz dike, û her tiştê ku te afirandiye!
…
Û dema tu di asoyê xaherê (rojava) ra diçî!
Tarîtî mîna mirinê dadikeve ser zemînê!
…
Her şêrek ji lana xwe derdikeve!
Û hemû ejdeha û mar dadakirinê bi kar tînin !
…
Zemîn çiqas xweşe, dema tu di aso ra derdikevî!
Û dema tu – Ey Atûn– ronahiya xwe bi roj didî!
Tu tarîtiyê ji pêş xwe têvedidî!
Û dema tu tîrêjên xwe dişînî!
Herdu zemîn (bakurê Misirê û başûrê wê) dikevin şahiyên rojane!
Her kesê li ser wan şiyar dibe û li ser pêyan radiweste!
...
Gava laş û bedenên xwe dişon, cil û bergên xwe li xwe dikin!
Û destên xwe bilind dikin, li ber derketina te bi rêzdarî radiwestin!
Û li seranserê cîhanê kar û erkên xwe pêktînin!
Û hemû terş û sewal li fêzên xwe bi aramî radiwestin!
Hemû dar û ber geş dibin!
Lawir û tilûr li çewrên xwe difirin!
Baskên xwe rakirî ne û spasdarên te ne!
Hemû pez semayê dike, li ser pêyan rawestiyane !
Û her kesê xwedî du baskan difire !
Hemû dijîn, dema tu derdidevkî!
…

Ey xwedayê yekane, ewê ku desthilata tikesî di ser ya wî ra nîne !
Ewê ku zemîn afirandiye, wek ku dilê wî xwastiye !
…
Afrîndariya te çiqas nirxdar û çake, ey xwedayê hemdem !
…
Tîrêjên te jiyanê dixin hemû baxan !
Gava tu derdikevî, jiyan di wan da hildavêje !
Tu yî, yê ku wan xwedî dike!
...
Tu bi tenhayî, yê ku bi wêneyê Atûnê zindî derdikevî!
Tu derdikevî, tîrêjê didî, bi dûr dikevî û dîsa vedigerî!
Tu bi hezaran teşeyan diafirînî!
…
Tu di dilê min da yî !
Kesek te nasnake, wek kurê te Exnatûn!
Te ew bi hêz û şiyana xwe kire aqilmend!
Cîhan di dest te da ye, bi awayê ku te ew afirandiye!
Gava tu derdikevî, jiyan dikeve wê!
Û gava tu diçî, ew dimire !
…
Te ev cîhan peyda kir !
Û her tiştê têda, te ji bo  kurê xwe pêk anî!
Exnatûn, xwediyê temenê dirêj!
Û ji bo kebaniya wî ya padîşahî û hezkirî!
Serdara herdu herêman (bakur û başûrê Misirê), Nefir-Nefir- Atûn -Nefirtîtî!
Ya ku geşdar dimîne, hemdem û hemdem[3].

## Lavaya Zardeşt ji bo xwedayê rojê:

Ji vê *lavaya Zardeşt* ra „*Xûrşîd – Yaşt*“ dibêjin. Peyva „*Xûrşîd*“ tê maneya „roj, tîrêja rojê“ û peyva „yaşt“ bi avestayî tê maneya „*lavij, dirûz (dua)*“. Ev „*Xûrşîd – Yaşt*“ rojê sê caran wek nimêj ji bo xweda dihate gotin; di dema derketina rojê da, di dema nîvro da û di dema rojava da[4]. Evin hin beş ji vê lajivê:

1- Kamiraniya rojê herdem bi tîrêje...
Em ji bo rojê nimêj dikin, ji bo ronahiya hemdem.
Hespên wê pir beza ne
Gava derdikeve.
Gava roj germahiyê dide.
Hemû xweda radiwestin.
Bi sedhezaran ji wan.
Û kamiraniyê hildibijêrin.
Kamiraniyê pêşkêş dikin.
Û kamiraniyê diyarî dikin.
Ji bo zemîna ku ji Mazda da hatiye diyarîkirin.
Geşbûnê diyarî cihanê dikin.
Û rûmetê diyarî rastiyê dikin.

2- Gava roj hiltê.
Gava ronahiyê dide zemîna ku ji Mazda da hatiye diyarîkirin.
Ronahiyê dide hemû avan,
û her tiştên wek wan.

Kan û jêderên avan û deryayan.
Ronahiyê dide afrînberan.
Û hemû giyanên pîroz.

3- Û heger roj dernekeve.
Iblîs her tiştê li ser zemînê têkdidin.
Hîngê yên rastgo wê nikaribin cîhanê ji wan rizgarbikin.

4- Yê ku ji bo rojê nimêj dike.
Ji bo ronahiya hemdem.
Hespên wî yên beza
Ewê şerê îblîsan bikin.
Ewên ku ji tariyê peyda bûne.
Daku şerê dizan bikin.
Ji sihirbaz û remildaran.
…
5- Ez ji bo kamiraniyê nimêj dikim.
…
Ez rojê pîroz dibînim.
Û em nimêja xwe dikin
Ji bo kesê ku nimêja xwe
Ji Ahûra-Mezdayê xêrdar ra dike.

6- Wek serwerê herî nirxdar.
Ez ji bo roja hemdem hêvîdikim.
Payedarî û nimêj, mezinahî û hêz.
Roja teysîdar, xwediya hespên beza.
Ji xêr û bereketan, rastî ya here nirxdare[5].

Gelo çi wekhevî di navbera lavaya *Exnatûn* û ya *Zardeşt* da heye? Gelo bandora her yekî ji wan li yê din bûye? Gelo wekhevî di navbera herdu baweriyên *Atûnî* û *Zardeştî* da heye? Yan ew herdu ji yek kaniya çandî-ayînî hevbeş hildavêjin?
Di xeleka dahatî da emê li bersiva van pirsan bikolin.

## Jêder

[1] Mouris Roban, dîroka ramanên siyasî yên berhevdar, rûpel 191. Wiliam Langer, Berfirehiya dîroka cîhanê, 1/49. Amer Suleiman, Ehmed malik El-Fîtyan, Hin semînar di dîroka kevnar da, rûpel 285. Firas El-Sewwah, bûyera Tewratî û rojhilatê nêzîk yê kevin, rûpel 56. Ebdulezîz Salih, rojhilatê nêzîk yê kevin, rûpel 216.
[2] Hanna Ebud, mîtologiya cîhanî, rûpel 211. Samuel Nuh Kremer, efsaneyên cîhana kevnar, rûpel 294. Geofry Barner, baweriyên ayînî li ba gelan, rûpel 137, Wiliam Langer, Berfirehiya dîroka cîhanê, 1/91.
[3] Wiliams Durant, dîroka şaristaniyê, 2/169-175.
[4] Avesta, Yasht, rûpel 370 - 432.
[5] Avesta, Khorshid-Yasht, rûpel 433-436.